Taurus - Ga

Silêman Demir
Silemand@yahoo.se

Demekê ji deman; dotmîreke sipehî bi navê Awrupa li bajarê Sîdon hebû. Awrupa wilo sipehî ye ku, sipehîbûna wê ji erdê û asman herduyan xuya dike.

Dotmîra wilo sipehî Awrupa keça mîr Agenor û jinmîr Telefassa ye. Mîr Agenor mîrê Fenîke ye û li bajarê Sîdon (Saîda) hukûm dike. Wî çaxî Fenîke, Lubnan, Filestîn û Israyîla niha ye.

Rojekê ji rojan, gava Awrupa sipehî û hevalên xwe derdikevin derveyî bajêr, nêzîkî qeraxa deryayê û seyranê dikin, ji xwe re kulîlkan didin hev, Zeus wê dibîne, dil dikeve wê. Zeus xwe nagire, radibe di şiklê gayekî sipî û sipehî de dadikeve, dikeve nav çend dewarên ku li wir in û hêdî hêdî diçe ba wê. Ji ber ku tu însan nikarin Zeus di şiklê wî yê rast de bibînin, ew xwe dike ga û diçe ba wê. Ya na, gava nû wî bibînin, wê ji ber dîtina sipehîbûna wî û xofê di cîhê xwe de bişewitin, wê bibin rejî û kevir.

Gava Zeus wek ga diçe bal Awrupayê, hevalên wê hemû jê ditirsin û direvin, lê ew bi xwe ji wî hez dike, dixwaze pê şa bibe û destê xwe dirêjî wî dike. Ga jî diçe û li ber lingên wê mexel dihê. Awrupa pê şa dibe û gava lê siwar dibe, ga radibe ser xwe û berê xwe dide nav deryayê. Awrupa xwe pê ve digire û dike hewar û, lê ga xwe berdide nav avê û wê dibe girava Gîrîtê. Li wir, li ser kaniya Gortyna li ber sîha darên platan (platanus acerifolia) ji nû ve ji şiklê gê derdikeve, dibe çikê mirovan û pê re radize. Ji ber ku ew dar wî çaxî sîhê û sitarê didin evîna Zeus, ji wê rojê ve pelên xwe çile jî nema diweşînin, ew her şîn û geş dimînin. Zeus wê şînbûn, geşî û sipehîbûnê, ji ber mêvanperwerî, dilfirehî, merdî û cîdana wan a wê rojê diyarî wan dike.

(Wilo dihê gotin, lê platan, şiklekî çinaran e û çinar pelên xwe diweşînin.)

Zeus wî çaxî, gayê ku di şiklê wî de dihê, dişîne ezmên û Awrupa li

wir dimîne. Zeus, gê di Zodîakê de dike sitêrikên bi navê Ga (bi lat. Taurus) û li wir dihêle. (Zodîak, ji gotina Yûnanî zoo dihê. Zodîak, navê koma sitêrikên ku di Eklîptîkê de xeta heywanan pêk tînin e. Hemû 48 in. Yûnaniyekî bi navê Ptolemaîos di deam xwe de li gora zaniyarî, nav û lihevdûkirinên salan ên dema antîk ew li ser nexşeyê raxistine.

Ptolemaîos ji Aleksandrîa (Îskenderiye) ye. Ew, karê xwe di pirtûka xwe ya bi navê Megale Syntaxîs, (bi erebî Almagest) de p.z.150 eşkere kiriye. Ew navlêkirinên wî, heta îro jî hilnehatine. Di heqîqeta xwe de Yûnaniyekî din ê bi navê Hîpparkos, sêsed salan berî wî xeleka heywanan ava kiriye. Ew dozdeh in.

Sîstemê falan ku îro li dinyê di rojname û kovaran de dihên ravekirin, li gora wan in. Hîna ji dema Asûriyan û Babîlan ve dihê bikaranîn.)

Koma sitêrikên bi navê Ga, wek serê gayekî ye. Herduyên herî jor, serê sturehên wî nin. Aldebaran û a hemberî xwe, çavên wî ne. Aldebaran sitêrika Gê ya herî bi şemal e. Gelekî mezin e. Heger mirov wê û royê bi hev re biçûk bike, heta ew bibe wek hêkekê, wê ro bibe wek niquteke ji serê pênûsekê. Navê Aldebaran bi erebî ye.

Gava mirov li Orîon binere, bêyî ku mirov serê xwe bizîvirîne, bi qorziya çavê rastê, hinekî li jor Aldebaran û ên din xuya dikin. Aldebaran zer e û yek ji sitêrikên bi şemal e, yek ji ên yekemîn e.

Piştî ku Zeus ji girava Gîrîtê ji ba Awrupayê diçe, emir dide lawê xwe Hefaîstosê hesinker da hûtekî ji maden çê bike, da wî wek xelat bide Awrupayê, da bibe parezgerê wê û girava ku lê ye. Hefaîstos radibe hûtekî gelekî mezin û xurt jê re çêdike. Zeus navê wî dike Talos û wî datîne girava Gîrîtê da li ber Awrupayê û giravê tevî be, da wê û giravê her û her biparêze.

Awrupa, wilo li Gîrîtê dimîne û ji tovê Zeus ê evîna roja li ser kaniya Gortyna, li bin darên platan, du lawan re tîne: Mînos û Rhadamanthys. Lê Awrupa, bi dû re, yanî piştî ku ji zarokên Zeus re dibe dê, bi mîrê wir, mîr Asterîon re dizewice. Mîr Asterîon zarokên wê qebûl dike û ji wan re bavitiyê dike. Gava herdu lawên wê mezin dibin, li Gîrîtê dibin mîr û mezin. Mînos bi xwe, salên dirêj mîrîtî li wir kiriye, gelekî xurt e û navdar e.

Hin dibêjin ku Awrupa wî çaxî sê law anîne: Sarpedon jî aniye. Ew û herdu birayên xwe li ser pîrekan dikevin hemberî hev, birayên wî ji wir berdidin wî, ew ji wir diçê hêla Asya biçûk mîrekiya Lykia ava dike. Lê li gelek deverên din derdikeve ku ew Sarpedonê ku li Lykia

mîr e, lawê Zeus û Laomedia ye.

Piştî ku Mînos û Rhadamanthys dimirin, bi kekê xwe yê ne ji dê, bi Aîakosê kalikê Akhîlleus re, li ba mamê xwe Hades dibin dadgêrên bin erdê, ên tartarosa welatê miriyan.

Dihê gotin ku gava Awrupa winda dibe, bavê wê mîr Agenor gelek li ber wê dikeve, lawên xwe bi dûv wê de dişîne da bibînin û bi paş de bibin. Ew, Kadmos, Kîlîx û Phoenîx in. Di nav deryayê de li vir dikevin û li wir dikevin û diçin. Tavilê rojekê di Yûnanistanê re derdikevin û li wir li Awrupa sipehî digerin.

Kadmos kekê mezin e. Pêşî diçe Orakela Delfî û li xuşka xwe dipirse. (Orakela Delfî, perestgeha Apollon e, lê hemû xwedayên mezin li wir bersivên pirsên mirovan didin, rê pêş wan dikin, şîretan li wan dikin û wan ji qederê agehdar dikin. Her demê şêxek bi navê Python li ser navê xwedan li wir e.) Li wir ji Kadmos re dihê gotin ku divê ew bajarekî ava bike û lê bibe mîr û dev ji gera li Awrupayê berde. Warê cenawirekî har e. Divê pêşî bikaribe wî bikuje. Kadmos bi emir û xwestina Orakelê dike û diçe, bi alîkariya xweda Athene wî cenawirî dikuje, bajarê Thebe li wir ava dike û lê dibe mîr. Thebe, nêzîkî Atînayê ye.

Kadmos li wir dimîne û bi dû re keça xwedayê şeran Ares û Afrodîhte, Harmonîa ji xwe re tîne. Zarokên wan çê dibin û zêde dibin. Bi wî awayî, Thebeyî, Ares wek pêşiyê xwe, wek bapîrê xwe hesab dikin û jê re îbadetê dikin.

Zeus bi dû re dil dikeve keça Kadmos û Harmonîa a bi navê Semele. Carê diçe û ji wê jî hez dike, pê re radize. Semelê ji wê hezkirinê, Dîonysos ji Zeus re tîne. Dîonysos li ba Romiyan, Bacchos e. Dîonysos dibe xwedayekî gelekî mezin ê bereketê, dansê, meyê, evînê û azweriyê.

Her çî Awrupa ye, navê wê li beşê dinyê ku îro jê re Ewrûpa dihê gotin hatiye kirin. Û her wilo, niha Awrupa, navê hîveke dora Jupiter e. Jupiter, navê Zeus ê bi latînî ye. Galîleî sala 1610 Awrupa dîtiye û ew nav lê kiriye.

Gava dor hatiye nav û navlêkirinan, baştir e ku bahsa navê asya bê kirin. Navê keçek ji keçên Occeanos û Tethys ên sipehî, Asia ye. Asia dotmama Zeus e. Dihê gotin ku navê wê keça sipehî li beşê dinyê ku îro jê re asya dihê gotin hatiye kirin.